

Li Rojava Yê Kurdistanê Pîlangêrî Eşkere Bû



Enfal

Enfal deqnameyeke ji deqnameyên qurana pîrozmend, ew deqname naveroka wê li ser talan û ferhûda xwedê nenasan di axive, dema ko supaya musulmanan xwedênenasan dişikne û arzî û saman û xan û danên wan talan dikin wê gavê lihev dabeş û parvedikin, demekî ew kiryar jêre tê gotin enfal. Lê mixabin kurd paşî hezar û çar sed salan ko ew paktîrîn û çetîrîn milletê musulmanin di cihana islamî de ketine ber helmetên enfal kirinê jibal erebên tekfîrî berberî ve, çinkî heta nûke tu fetwayeke rewaxwaz derneketiye dijî ew kirêt kiryarê dema ko sedam û rijêma xwe enfal bikaranîn li başûrê kurdistanê, û îro roj jî ev kirêt kiryar bi cihûpêktê bi şeweyekî rût û hîz, demekî em li himberî qirkirin û tehfil kirinek netewx-wazîne, divê dahola cenga welatparêzî û netewperwerî li darkeve bê dudulî û paşvekêşan ji gorepana dîroka destbidar.

2

**Aloziya
Rewşenbîriya
Kurdî**

3

**Reftarê
Endamê
Partî**

Li rojava yê kurdistanê pîlangêrî eşkere bû

loloxan

Şoreşa sûrya yê gelek nihênî bellûkirin li gorepana şer û pevçûnan û li navtaxa dijberiya siyasî de , wa diyare ko milmilana leşkerî û çekdarî roj bi roj gûr û gurix dibi , lê pêre buyer û qewmanên siyasî hevdû hiltînin û nexasma jibal komerîşkên çekdar ve çi (cebheya nusre) be û çi (dewleta îraq û şam)be û ligel wan çendîn komerîşkên dîtir jî yên ko girêdaîne bi supaya azad ve , ewên ko dijminatîya xwe eşkerekirin dijî mîletê kurd û nexasma di evan heyamên dawî de çi li girê sipî û li kobanê û çi li til eren û çi li til haslê dema ko mîrekê ewan komerîşkên tekfîrî û xwedê nenas tehfilkirina xwîna kurd eşkere kir di daxwîyanîyeke de û wisa gund û bajarên kurdî xistin ber talan û ferhodê çi li astê kuştin û vequştinê û çi li astê talan kirina malan û teqandînin û şewtandîna saman û arzî û xan û dan û wisa de vera kurdî dane ber wêranê bi behaneya şer dijî ypg ew



hêza ko alîgirê rijêma esede , lê daxwîyanîyên serkirdeyekî supeya azad wek ebdilcebar igêdî bi binkirina gelê kurd rûbendê rastîyê da alî ji ser ruçkê ewan tekfîrîfaştên ereb ewên ko mebest û armancên wan belû bûn dako herêma rojavayê kurdistanê bi ser nekeve ji ber evê xalbestê dixwazin guherîneke dîmuqrafi çêbikin li de vera girê sipî û kobanê dako veqetandin serrast bibe

di cugrafiya rojavayê kurdistanê de . Bê dengiya dijberiya sûrya yê li ser ewan buyerên û qewmanên ber bi çav û mendehoş sê metirsîyên serekî tyni gorepana berpîrsîyariyê :
1- ji hevxiştina sûrya yê weko dewletek serbixwe , ne weko hatiye gotin yek mîlet û yek armanc di dewletek şarîstanî de li ser bîngeha pêkve jîyanê û pîrhîjmarîya siyasî û veguhastîna

jîyana dîmokrasi weko desthilateke nûdem û serdest ji hemû pêkhatan li darkeve .

2- nerîn û tînerînen şaş û çewt di hilêb û çareseriyên siyasî de li ser astê navxoî dema ko ew dijberî ligelê kurd di nere weko geleki dijmin û wisa cengeba-ziya wî diki li ser bîngeha netewperîstîyê da ko gelê kurd bimîne dûvelank jî netewa ereb re ne weke neteweyke serbixwe xwedî taybetmendiyên regez kês û çandexwaz di çarçûveya dewleta nûdem de .

3- rêçarekirina kurd di nava du şewazên fermanraniyê de yaxod peji-randîna sîstemê sepandîna dijberîya ereb weko fermanraniyeke îslamx-wazî tekfîrî , yaxod der be der kirin û koçberî di rêya dorpeçkirina abûrî û ewlekarî û rewşenbîrî .

Wa diyare ko paşî hezar û çar sed salî mirovê ereb nehatiye guhartin di bin karîgerîya îslamê de û wisa sewdanên konber yê civaka erebî dêmekî em li himberî komkujiyeke enfanxwazî nûjenin û wisa hemû sedem û egerên cûdabûnê û veqetandin li ber destî .

Aloziya rewşenbîriya Kurdî

Bilind Mela – Dêrik
e_bilind@nefel.com



Dî warê jîyana rewşenbîriya kurdan de, şer di navbera peyv û pênuşan de peyda dibe. Bîr û boçûn, bi dehan beramberî hev dibin û hemî di çemekî bê serûber de wenda dibin, bê ku yek bigirin û bikarin xwe ji vê aloziyê rêzgar bikin û ber bi asoyeke geş biçin, lewra pîrsgirêka rewşenbîriyê di qad û meydana de ye, pêwîst e rewşenbîrên Kurd hizr û bîrên xwe di rewşenbîriya Kurdî de bikin, ji ber ku ew e jêder û palderê rewşenbîriyê. Ji ber vê yekê berî her tiştî pêdvî ye rewşenbîr bizane çi rade li cem xwe beramber wan peyv û berhemên xwe, yan wan armanc û vîyanan dest nîşan bike, mîna : azadî, dîmoqratî, mafê mirovan. Ji ber ku çendatîya vîyana rastî li cem mirov girêdayî ye rastîya mirov li cem xwe de, lewra bi şeweyekî sanahî ew e were tîbînîkirin, dema ku mirov dikeve di warê karkirina hizr û bîran de, û ji alîyek di ve her


wek ezmûnekê di cîhanê de tê diyarkirin . Kes tu kesî rizgar nake, ji ber vê mebestê, divê mirov bi xwe bi rêya berhem û hizrên xwe bi şeweyekî dahênan û afirandîni rizgar bike, ji ber ku girîngtirîn binemayên rizgarkirina rewşenbîrî ji qeyd û zincîran ew e bi karê xwe rizgar bike ji xweyatîya xwe, ji ber ku çandatiya rastîya navx-weya kesatiya rewşenbîrî wê rê li ber veke ta ku bikare rola xwe wek rewşenbîr saz bike û li vê derê cûreyekî nû yê rexne peyda dibe di kesatiya mirov de, ku rexne li kar û berhem û gotinên mirov û em dikarin bêjin bi navê rexneya hiş û ramanan e. Ev cûreyê he ye rexne baştirîn û mez-intirîn palder û jêder, ku bikare alîkarîya mirovatîyê bike ev jî bi şeweyekî zindî ji ber diyarkirina hizrê li cem mirov xwe xurt dîke û bi sanahî berû asoyeke geştir û nuhtir û ji alîyek di ve binemayên hel-singandinê û pêşveberîya kar li cem mirov xurt dibin

û zêdetir dibin û bivê yekê mirov dikare bi çi rengî alîkarî guherîne bike û ber bi asteke baştir biçe . û dîsa em e veqerîn bêjin çendatiya guherîna . û pêşveberîya jîyanê girêdayî ye bi çendatiya rastîya mirov bi xwe digel xwede û heta çi radeyê mirov amade ye xwe biguhêrine beramberî her rastîyekê. Bê guman di wêjeya guherîn û pêşveberî li ser wî were ber-hemkirin. Û her pirtûkeke nû bixwîne dergehêkî cîhanî vedike yan bi neynika nû de li ser wijdan û cîhana hizr û boçûnên wî zêde dîke ji ber ku ti nivîskar di cîhanê de bê hestdijwar û dilvînek nînin vê hemûyê kom dîke û hindek caran ji yek cuda dîke û ji van hemûyan hizrên nû her roj peyda dibin û divê xwe li ser pênuşa nivîser û kaxezan wî de biçesipîne û bi xurtî lê dikin ta ku peyv derkevin ser kaxezan û ew qalibên dixwazin bidest bixên û her wesa rengê divên û li ser pênuş û şeweyê der-

birîna nivîser da dişopînin , û birêkekî berz diçe. Û wek tê zanîn rewşenbîr yek ji binemayên avahîya mirovî ye û jêderkw sereke ye ji ber pêşvebirina berî jîyanê ye û bi taybetî ji ber civaka me ye. Ji ber vê jî heger em binêrin di dîroka xwe ya berî çend çerxa her ji Mîdyâ ta niho Kurd nebûne xwedan rewşenbîriya serbixwe. rewşenbîriya netewî dide diyarkirin ku Kurd wek hizr dagîr kiriyê. Her eve ye ji ber eger nebûna rewşenbîriya hizrî ya serbixwe lewra dîyar e demê ku hizr dagîrkerî bê mirov nabe xwedanê kesatiyek netewî ya xurt. Ji ber vê yekê iro berî

sibehê pêdvî ye em xurîtbîna binemayên rewşenbîrî ya serbixwe mîna dîrokzanî , keltur niştîman . Çi li navendên fêrgehê û çi ji damezrandîna dezgehên taybet ji ber vê mebestê û her wesa ji layê dezgehên ragî-handîne ve wek di xizmeta rewşenbîriya hizrê ya serbixwe bin û bi zimanzana û kultûr û torevanan were danîn ji ber ku rênîma û bine-mayên rewşenbîrî ya netewî were avakirin û valahîya çendîn sale were di xizmeta mirovan de ji ber ku mîfakirin ji çendîn layên were dagirtin û kesatiya hizr ya serbixwe were avakirin.





Parastina jinê di hişyariya wê de ye

Leyla Sadûn - Dêrik

Raste rewşa jina kurd baştîre ji rewşa jinên hawîrdorî xwe, û bi taybetî jirewşa jina Erebya ku di nava rewşeke reş û tarî de dijî, û hêdest û hişê wê bi qeyd û bendin asê girêdayî ye. Lê ev wê wateyê nadê ku jina kurd di rewşeke pir geştir û pêşketîtîr de ye. Ne veşartîye di civaka kurdî de zîlam bi xwe alikare bi jinê re, destê wê digire, daxwaza pêşveçûna jinê û berevaniya di ber mafê wê de dike. Ev axaftin û daxwaz gelekî tîr dubarekirin û bihîstin. Ji xwe hin mirov hene bi xurtî û bi pîrbûn van gotinan didêrin, lê dema rastî li rastiye dike ew mirov bi xwe diji gotinên xwe derdikevin û berî her kesî di rûyê jinê û mafê wê de radiwestin. Erê, gelekî dibêjin, lê li ser rûyê erdê li gotin û nerînên xwe xwedî dernakevin û wan napêjin. Ev rengê an pir di nava rêzên rêxistin û partîyan de tênedîtîr. Ew ditirsînin ji jinê yan bi gotineke di ew li se rjinê ditirsînin, jiber dibêjin jin darê şikestîye û lawaze, û nikarê bixwe giraniya barê ci-

vakê û gotinên wê hilgire, jiber baweriyê bi şîyanên jinê û hêza wê nayînî, ku jin ji wekî zilame. Raste hin tişt hene ku jin nikare bike yan zehmete pêrabe, lê divê ew bizanî ku jin ji dikare tiştina bike ku zîlam nikare bike. Lê divê em bi hev re bigihin wê baweriyê ku herdu du alîne, her yek ji wana yê dîtîr temam dike, dema aliyek wenda bibe, ne xwekê masî he ye û ewtişt çî be jî, ew sernakeve. Wek çawê zîlam xwedî şîyan û hêze, wisa ji jin di alîna di de xwedî hêze û dikare di gelek alîyan de serbikeve û serkeftînan bi dest xweve bigire. Ji ber vê yekê ji divê zîlam bighê wê baweriyê ku ne ewe yê ku dikare jinê di civakê de xweşik bike û biparêze. Parastina jinê di stûyê wê de ye, tenê ew berpirsiyare di ber parastina xwe de û em dibînin ku parastina jinê bi hişyarkirin û zanînkirina wêye, jiber dema jin hişyar û zanabibe, wê ew xwe bi hiş û mejiyê xwe bikare xwe biparêze. Nexwe bi kurtî em dikarin bêjin parastina jinê di şarezabûn û hişyariyê de ye.



Reftarê endamê partî



Ehmed Lewend

S aloxdan û Reftarê endamê partî piştî tevlibûna herdu baskên di yên partî tê xwestin go bivî rengîbin. Behwerî di navbera

endamê partî û laşê partî de hebê, û pejrandin û hatina rêzê Partî ji çî kesê bixwazê tevlibûna rêzê partî bê li gorî sistema hundiro (Peyrew) û Tê xwestin go endamê partî pêkhatîbê di layê konevanî, zanistî, civakîde ta karîbê kar di navbera cemawerê kurde bikê, û Tê xwestin endamê partî Xemxwarê netewa kurdî bê, durî Derbegyê û şufîniyetê bê ji aliyê kêmnêwê di ve û bi mafê ware bê, ta karîbê daxwaza mafê kurd bikê Dîtina xwe ya kesayetî di

nav cemawerê kurde nedê, lê nerîna partî bidê û Berevanî di ber nerînê partî de bikê, li her cihekî û Haj kesayetya xwe ya partî hebê di nav bera cemawerê kurde, û Haj yekîtya partî û hevgirtina partî hebê duri jevketinê bê û Ne duri ce'd û sikaka kurd bê, nêzikî cemawerê, Haj demê hebê û sudwergirtinê jê bigrê, û Dan û sitandinê bi hevalê xwêre bikê bi xakîbûn û bi dijmnê xwêre bi Difin bilind bê, û Sudwergirtinê Ji ezmûnê bilî miletê xwe

bigrê bê kobîkirin. Rêzgirtin ji kevnetorê her kesî re bigrê, û endamê partî Rewşa welat bexê di ber çavada ji hemî layeyan, û Rêz û hurmet ji serkerde yê kurd û kurdistanê re û sembolê niştîmanyê bigrê, û Dûrbûn ji kesayetya li ser vî taî yan tayê di, û Çandina hestê netewî û rûmet ji rêbaza barzanî re, Pêdan û babend bi civan û demê re, û Pêdan bi Dilsozî dan û sitandinê, û şaristanî bê di lixwekirina cilk û berga de

AMÛDA BERXWEDANÊ

Di şoreşa sûrî ya pîroz, şoreşa azadiyê û rûmetê bajarê AMÛDÊ roleke pir mezin û giring list, bi serkirdayetiya çalakvanan, kesayetên serbixwe û rêxistinên siyasî û beşdarbûna hemû xelkên amûdê ji ciwanan, keç, jin û kal. Lê sed mixabin ev bajarê xwedî dîrokek kevin û resen di şaresdana kurdî de, hêma kurdayetiye û berxwedanê çirûska vî bajarî hat vemrandin li ser qirêjê bi-rayên kurd, û di encama êrîşkirina hêzên y p g li ser xwepêşandana sivil pakrewan, birîndar ketin lê ta dema anha ti kavên ji bo lihevhatineke çê nebûye ji aliyê p y d, û lêborînek bo malbatên

pakrewana ne bû ye, û ev kuştina van pakrewanan nebû ye bi navê komkuji, û bê dengîyek ji aliyê partiyên ENKS rawestana kar, çalakî û xwepêşandanan, û xelkê amûdê jiyaneke zor û zehmat derbas dikin û aloziyan di warê abûrî de dibînin, buhaya gelek tiştên jiyane wek xwarin, nan û tenduristî û ji aliyê birîna av û elektrîkê de li ser bajar keş û seqa bir germin, mirovên amûdê gazin û rexin dikin ji berpirsiyarê bajarê, ev bajarê dîrokî wê van astengî û aloziyan derbaskin bi hizir û viyana mirovê wê, lê di heman demê de ev bajar wê her bimîne keleha xebat û berxwedanê û mînak û simbolek ji bo gelê kurd.



Dijwar Tewfiq



Tenazî Tu zanî çî bû ?

Can Bapîr

Kurd li Rojava bûne yek !!!.. dest helat hate ragihandin ..! Wezaret belav bûn, Şaliyarên kiîîîî n û dirêêêêj.. Qeels û yên Qelaw ..!

dibêjin Ala me bû yek, keske sor li ezmanê me hilat, dibêjin mirî ji Goristanan şiyar bûn ..!, û bi Yeketiya me şad û serfiraz bûn..., nema Ehmedê Xanî dibêje: Aya bi çî rengî mane(mehrûm), û Zembîl Firoş poşmane li ser strana "Ez xwedî Eyal im, Zarok birçî li mal in" ..!, Qazî û Şêx se,îd ji sêdarê ne poşmanin, dibêjin: Ked, Xwîn û Xwêdana me neçû vala, em bûn xwedî Dewlet û Al, baliyoz rêkirin her Welatî û di nav Kurdan de Yekrêzî peyda bû û parçebûn ji hole rabû ..!!


di xiveta penaberiyê de Dayika Ciwan ew ji xew şiyar kir û xewna wî li gel Bayê xivetê berba bû û çû, ev xewna Xwena Ciwan bû, lê rastî bervaciyê Xwena wî derket .



Felekedîn Kakayî ferîştayê Aştiyê

Narîn Omer

Ferîşte ne tenê li asîmanan dijîn, belê ew li ser "Gokazemîn" jî peydadibin, di nav jîndar û mirovan de jî hene. Raste hijmara wan pir kême, lê ew hijmar dikare rengên cuda bide wî warê kû ew tede dijîn. Bi vî hawî em dikarin erêbikin kû nemir "Felekedîn Kakayî" yek ji van ferîştayên gerdûniyê, ji ber kû wî jiyana xwe di xizmeta aştiyê û aramiyê de derbaskiriyê, wî bêhtirîn salên temenê xwe qurbanî û ribazên jiyana aştiyê û aram xweşkiriyê, weko "Pêşmerge", pêşmergeyê "çêk û pêñûsê", weko nivîser, weko rewşenbîr û wezîrê rewşenbîriyê di hikûmeta herêma Kurdistanê de, belê weko "Ramyar", û em baş dizanin çiqas hijmara ramyaran di welatê me de kême. Belê Felekedîn "ferîştayek gerdûniyê" jiber kû ew her û her çêkdarê hebûn û mayîna gelê kurd bû, û pehlewane dîlana pêñûsê bû. Di nav erezoyên wî de azadiya kurdan semadar bû, di nav rûpelên dilê wî de kulîkên aştiyê rengereng dibûn. Di himbêza wî de pêşeroja aramiya gelê wî pir-pirikên dilsoziyê bi can û cendek dikirin. Felekedîn Kakayê ferîştayê "Goka Zemîn" bû, û neha dibe "Ferîştayê Asîmanan", û berhemên aştiyê û aramiyê û ramyariya giyanê xwe di asoyên hemî kurdan de belav dike.



Bêdengiyê em kuştin



Mihemed Ebdê

Di dilê min de birînek kûr heye bê denge?
mîna piringê, dilê min disoje
Wek lehiya Çemê bê deng di tavên buharê de, di herik e!
Mîna mirovekî lal qîr dike!
Tenê dilê min şewata xwe nasdike
Û di hisreta xwe de tê gevaztin
Mîna sêwiyan di bin barê tenahiya xwe de dimîn e?
Tenê matmayî dimînim, ku mirov, mirovan dixapînin
Sipî reş dikin, bi xwînê Sor dikin..!?
Welatê min bûye gestîna Kundan
Bûye warê dijîtiyê, fêrbûna Kewan ?
Zindan bûne warê şoeşgêran û bi rûmetan
Tenê ez di hemî serdemên dirokî de tewanbarim bi gunehan
Amûdê li ber diroka te dirok bê bejne!
Ji berxwedana te û Sînemeya te şerm dikim,
Ku ez nikarim rîya baiarê xwe ji ter vakim û te hibêz bikim?
Ez ê şîna te li ser diwarê dirokê binivisim!
Çimkû ziman di şkefta xwe de palda ye?
Deng qedexe ye!
Kuştin rewa ye,
Pakrewan bê rûmetin ?
Gulle dihêle deng
Newêrek be
Bizdonek be
Tirsonêk be...!?

